Mele Xelîlê Sêrtî

# Nehc-ul Enam

Stockholm 1988

# NEHC-UL ENAM

*"Yek Mewlana Xelîlê Sierdî*
*Siwarê hespê kêmweşê kurdî*
*Nivişteк bi navê Nehc-ul Enam*
*Bi zarê kurdî, lê ji bo xas û am".*

*Cigerxwîn*

**Weşan no: 3** **Rêza edebiyatê no: 2**

Publishing House of Kurdistan
Editor: Hanefi Celepli
Printed in Sweden
By APEC tryck och förlag
Stockholm 1988
ISBN 91-87096-02-1

# NEHC-UL ENAM

**Mele Xelîlê Sêrtî**

Guhartin ji tîpên erebî:
**Zeynelabîdîn Kaya**

**Weşanxana Kurdistan**
Stockholm 1988

# PÊŞGOTIN

NEHC-UL ENAM ji bîstûpênc destnivîsarên seydayê Mele Xelîlê Sêrtî -ku heşt ji wan manzûmin- yeke. Pirtûk ji bîstûdu sernav û dused û heftêyek beytan pêktê. Bi babet û naveroka xweve, talîm û terbiye û şîretin. Bi şiirtî û bi zarê kurmancî hatiye nivîsîn. Bi fesahet û rûmeta xwe ya xezeltiyêve, dilê her xwendevanî xweş û geş dike.

Seydayê Mele Xelîl, di sala 1754-ande li Hîzanê ji dayika xwe bûye û di sala 1843-yande jî li bajarê Sêrtê serê xwe daniye. Di dinyayêde, kêm kesan hewqas eserên giranbiha nivîsîne. Eger lêkolîn û lêgerînek li ser Seydayê nazim û li ser eserên wî bête kirin, meziniya wî û hêjayiya eserên wî wê baştir bête famkirin.

Çawa ku di kitêba "Osmanlî Muelîflerî"de hatiye nivîsîn; Seyda, "...piştî ku xwendina xwe li nik alimên Kurdistanê kuta kir, li wîlayeta Sierdê îqamet kir û jiyana xwe di belavkirina 'ilm û nivîsandina eserande derbas kir".

Nehc-ul Enam li Kurdistanê baş hatiye naskirin û zarokên kurd vê eserê dixwînin û jiber dikin û li her cihî jê jêderkan digrin. Lê mixabin xwendevanên kurd, yên ku herfên erebî nizanin, ji xwendina wê bêparin û hejmara herî pirr jî ewin.

Seydayê Cegerxwîn weha gotiye:

"*Yek Mewlana Xelîlê Sierdî*
*Siwarê hespê kêmweşê kurdî*
*Nivîştek bi navê Nehc-ul Enam*
*Bi zarê kurdî, lê ji bo xas û am*".

Ji bo xwendevanan me Nehc-ul Enam, ji tîpên erebî guharte tîpên latînî. Ji bo ku fersend û mecalên xwendeva-nan çêbin da ku vê pirtûkê bixwînin û vêjeya zimanê kurdî di rêça helbestiyêde, merhela xizna wî binasin.

Armanca me ji weşandina Nehc-ul Enamê bi tîpên latînî –di gel orjînala erebî– eve, ku pêşkêşî xwendevanan bikin û vê berhema giranbiha ji mirina timî bifilitînin. Ev diyare ku ji ber qedexekirina zimanê kurdî li Kurdistana Bakûr xwendevanên me ji mîrata bavûkalan bêpar mane. De îcar xwedivê ku her kurdek lê xwedî derkeve. Ji ber vê yekê, me ev karê han pêk anî. Bi hindikayîbe jî, hêvîdarim ku wê tîrêjekê bide ziman û edebiyata me. Hem pirtûk bi tîpên latînî derdikeve holê û him jî pirtûkxana Kurdistanê dewlemendtir dibe.

**Zeynelabîdîn Kaya**

*BÎSMÎLLAHÎ REHMANÎ REHÎM*
*WE BÎHÎ NESTE'ÎN*

## MEBHES-UL FRUD-ÎL EYNIYETÎ

Tu guh dêre nutq û beyana fesîh,
Ji bo ferzueynane merdê melîh.

Ku îman û îslam û sewm û selat,
Li ser malidarane hec û zekat.

Li ser te ji ferzane ey nûrîcan,
Bizanî tu erkan û şertê di van.

Heçî hukmê şer'ê tu muhtacîbî,
Ji bo zanîna wê dê munqadîbî.

Tu îmanê baweriya dil bizan,
Mûtî'bûna îslam bi zahir bizan.

Welakin qe yek bê yekî nabitin,
Musulmanî bê herduwan nabitin.

Tu me'nayê şehdê ku bawer bikî,
Teleffuz eger qadirî pê bikî.

Ji kufrê tu bêşek xwe xaric dikî,
Welê eslê dînî tu hasil dikî.

Wekî ku digel "wê" emel jî bikî,
Tu îman û îslamê kamil dikî.

Me'anî ji bo wê evin, guh bidê,
Tu me'budê bilheq tunî j'bil Xwedê.

**MEBHES-UL SIFAT-IL SELBIYYETÎ**

Wucûda wî 'eyne ji bo zatê wî,
Ne ewwel ne axir ne zidde ewî.

Ne misl û zehîr û wezîr û mekan,
Ne mani' mûîn û cîhat û zeman.

Ne cism û ne cewher ne nûr û 'erez,
Ne zû lewn û mîqdar û şikl û merez.

Ne ewlad û zewcet, ne bab û ne da,
Ne hemkûf û mewt û zewala Xweda.

Nusûsê ku dalin li şola muhal,
Muewwel-ke mespêre ehlê delal.

Ji nefsa te nêzîktirînê teye,
Xebîrê bi ef'al û qewlê teye.

## MEBHES-UL SIFAT-ÎL SEB'ET-ÎL QEDÎMETÎ

Sifatê di seb'e ezel wî hene,
Ne 'eynin ne xeyrin ne wek êt mene.

Heyate di gel 'ilm û sem' û beser,
Îradet di gel qudreta xeyr û şer.

Murîde ji bo xeyr û şeran welê,
Riza wî tunîne bi şola nelê.

Ewê dî kelamê besîtê qedîm,
Hurûf û lûxet hedîsin ey hekîm.

Bi Qur'anê xeyrê wê mensûxî bûn,
Kemal û fedil bo me pê zêde bûn.

Heta ku qiyamet, dê herdu hebin,
Di 'uqbayê xwendayê wê her hebin.

Sifatê kemalî hemî, Reb hene,
Sîmatê di neqsî ne mewcûdene.

Tu navan tu bêşer'î lê damene
Ji nehwîd û neh navê wî zêdene.

Ji ketma 'edem, 'alem anî wucûd,
Bi vî wechê ehsen, wî şahê Wedûd.

Tu me'dûm û hadis bizane ewî,
Heyûla tunîne ku 'alem ji wê.

## MEBHES-UL MELAÎKETÎ

Melaîk ji bo wî hene bê ’eded,
Mudamî îbadet dikin bê meded.

Hinek jê xewasin, welê heryekî,
Vibuhtî kirî ew ji bo şolekî.

’Enasir çiharin, ji wanin melek,
Wekî ins û cin, nûre qismê gelek.

Di wan û di me ax û cinan hewa,
Di şeytani nare, ewê bê newa.

Ne mêr û ne jin, bê xwer û vexwerin,
Li şiklan-i qadir bi çeng û perin.

Fena dê bibin ew biçin Cennetê,
Ji bo ehlê wêre bikin xizmetê.

## MEBHESU EL RÎSALETÎ

Muhemmed resûlê Xwedaye hinar,
Ji bo ins û cin û melek pêşiwar.

Bi dînê wî dînê dî mensûxî bûn,
Kemal û fedil bo me pê zêde bûn.

Xwedê ew kire xatemê enbiya,
Welêkin ewe serwerê etqiya.

Ewî Ebdullah babe, da Amîne,
Medîne û Mekke mewlid û medfene.

Ji nesla Qureyşe, ji tuxmê 'ereb,
Nibuwwet di sala çilî dayê Reb.

Sisê dî ku borîn û ew bû resûl,
Mekke bo xwe deh salê dî kir qebûl.

Ji Mekkê ku balî Medînêve çû,
Li wê deh buwarin ji dunyayê çû.

## MEBHESU ŞEMAÎLÎHÎ

Li wî qametek mu'tedil bû letîf,
Ne kurt û dirêj û ne zexm û zeîf.

Ne reş bû, sipî-sorekî esmerî,
Mudewwer bû wech û rihên enwerî.

Ewî çav û burhê mukehhel hebûn,
Ji deh tayan şeyba wî neh zêde bûn.

Bi roj û bi şev, hem li pêş û li paş,
Wekî yek didî, haşe înkari haş!

## MEBHES-UL MI'RACÎ

Ji Ke'ba munewwer Xwedê leylekê,
Bire Mescîd-ul Eqsa ew lehzekê.

Hemî enbiya lê civan wê demê,
Li wê bû îmamê ewê 'alemê.

Ji wê ew bire Sîdret-ul Munteha,
Bi qabê du qewsan vibal xwe giha.

Bi ruh û cesedve ewî bir siwar,
Bi çavê serê xwe Xwedê dî, du car.

## MEBHES-UL RU'YETÎ

Di dunyayê kes dî, ji bil wî nedî
Di 'uqbayê mu'min dê bêjin me dî.

Li wê ew dibînin Rebbê 'aliye,
Welêkin heqîqet nizanin çiye.

Bi hindî resûlan îmanê tu bîn,
Tefadul ji bo wan li nik xwe nebîn.

## MEBHES-UL TEFAZULÎ

Welê "ness"ê dalin li fedla hinan,
Ji bo te bibêjim hemî efdelan.

Îbrahîm û Mûsa û Îsa û Nûh,
Bi tertîbê efdeltirin paşê Nûh.

Resûlin, li dû wanre peyxemberin,
Di pêve xewasê melek bihtirin.

Ji 'amê melek qenctirin, ey ciwan.
Jinê dunyewî çêtirin j'horiyan!

Ji hindî jinan Fatîme, pêve da,
Li dû 'Aîşene heçî ma beqa.

Ebûbekre efzeltirê ummetê,
Di kufrê neborandî yek saetê.

Li pêve 'Umer, ê ku nav dayiye
Bi "Farûq"î, Osman li paşê wiye.

Li dû wî 'Elî, sahibê "Zulfeqar",
Evananî sih sal xîlafet buwar.

Li pey vane Se'd û Zubeyr û Se'îd,
Di gel Ebdurrehmanê bûye şehîd.

Digel Telheto Bû 'Ubeyde bizan!
Ku "Eşr-ul mubeşşer" bûye navê wan.

Sebeb wê ku mizgîniya cennetê,
Ji bo wan ê hatî ji nik Hezretê.

Hemî ehlê Bedr û Uhud bey'etê,
Muheqqeq bûye, dê biçin cennetê.

Weha renge ezwac û 'itra Resûl,
Ji eshabê dîreye erca duxûl.

Ji herba sehaban mekin qal û qîl,
Bihiştîne hem qatil û hem qetîl.

Hemî da û babê di peyxemberan,
Berîne ji enwa'ê kufr û şeran.

## MEBHESU 'EDED-IL ENBIYAÎ

Çihar û sed û bîst hezarin nebî,
Rusul sêsed û sêzdehin, ey ebî.

Ne ehlin gunehkar û 'eybdar û jin
Ji peyxemberîre, welê qismê jin.

Dibin ku welî bin, keramatê wan,
Di dunyayê heqin, mebe ziddê wan.

## MEBHESU TE'SÎR-IL DU'AÎ

Du'ayan ku bê şek eser bo hene,
Ji def'a belayêre hingamene.

Xweşin Xizr û Îlyasî her vê demê
Nebîne, li derdan dikin melhemê.

Di Luqman û Îskenderî lec meke,
Ne peyxemberin, wê 'înadê meke.

## MEBHESU NESB-ÎL ÎMAMÎ

Ji ferzane nesba îmamê ku dîn
Hifizkit, ji mezlûmîre bit mu'în.

Herame li xelqê xurûca li wî,
Eger çi ku cewrê bibînin ji wî.

## MEBHES-UL ÎXTÎYAR-ÎL CUZ'Î

Xweda xaliqê cumle fi'la teye,
Welê îxtiyarî bi destê teye.

Ewe mubdi'ê fi'lê, kasib tuyî
Cezakarê fi'la ku talib bûyî.

Eser ku li fi'lê mûretteb dibit,
Bi îcad û fi'la wî peyda dibit.

Dişîtin we bê fi'lê peyda bikit,
Ku bê çav û koranî bîna bikit.

Ewê fi'lê cumle di bê 'illetin,
Welêkin ne xalî ji meslihetin.

Ecel her yeke ger çi kuştin bitin,
Qe şolek li wî nabe wacib bitin.

Wekî ku li te ew nekit şefqetê,
Tu naçî bihiştê sebeb ta'etê.

Welê ferze daîm tu ta'et bikî,
Recaya qebûlê ji wî her bikî.

Heram herwekî hillê rizqe ji wî,
Eger çi mu'eqqeb dikit te bi wî.

Tenasux ji bo ruh hulûla Xweda
Tu nînin, eya mu'minê canfida.

## MEBHESU 'ELAMAT-ÎL SA'ETÎ

'Elamet ji bo sa'etê ra pirrin,
Bi kullî ji ferzane bawerkirin.

Zuhûrbûna Mehdî, xurûca Deccal,
Dê nazilbî Îsa, ji bo zîddelal.

'Emel dê bi şer'a Nebiyê meket,
Xeracê û dînê fillan berzeket.

Ji paş heft-i salan neqil dê bibit,
Di qebra Nebiyê me medfûn bibit.

We Ye'cûc û Me'cûc ku pirr heybetin,
Digel Dabbet-ul erdê, rojdertin.

Ji Mexribve ew ku ji wê derkevit,
Derê tewbeê dê li nıe dakevit.

Hedîsa Deccalî hemî hifzîkin,
Mudamî ji fitna wî te'wîzîkin.

## MEBHESU SÛ'AL-ÎL QEBRÎ Û MEBHES-UL QIYAMETÎ

'Ezab û sûala di qebrê, heşir,
Hîsab û sîrat û mîzan û neşir,

Di gel cennet û hewz û narî heqin,
Weha renge çav û sihir jî heqin.

Li esmanê heft-iye cennet niha,
Cehennem li bin erdêye her weha.

Digel hindî eşya fena dê bibin,
Ji bil zatê Reb, paşê 'ewde bibin.

Dê eczaê cismî fena bin ji bin,
Ji bil 'es'esê, paşê mehşûrî bin.

Xwedê dê ewan faniyan 'ewdeket,
Bi 'erda hîsaba xwe hazir biket.

Dirêjket Sîratê li ser agirê,
Wedi'ket Şehînê li dûvê pirê.

Bidit destê rastê kitaba hinan,
Bi destê çepê yê hinan bêguman.

Hîsaba gunahan ji xelqê biket,
Xeraban û qencan ê pê ferq biket.

Evan dê bi fedla xwe derbazîket,
Ewan dê di narîde waqi' biket.

Heçî cennetî dê ji hewzê vexwin,
Hemî cehnemî her hemîmê vexwîn.

Gunehkar ê paşê dê jê derkevin,
Tucaran ê kafir bidernakevin.

Zulum nîne 'edle, heçî ku biket,
Di mulkê xwede ew teserruf diket.

Lê her yek ji me kafirek wî heye,
Bi fedla Xwedê ew fîdayê meye.

Mirovê gunahê mezin her kirî,
Muheqqeq nehin ew ji bo agirî.

Mu'ezzeb diket, yane aza diket,
Ji wîre, nê xelq jî şefa'et diket.

Ji rêve Muhemmed şefa'etçiye,
Di pêve heçî ku xudanqenciye.

Ji bo şehdê me'na evin bittemam,
Ewî lefzê meşhûrî beyn-el 'ewam.

We nîne tu bê vanî, mu'min nebî,
Welêkin bi înkarê kafir dibî.

Çi ku ferze tesdîq bikî tu, bira!
Bîma qed etana Rusûl-ul wera.

Weha renge tiştê weh, ku muctemi',
Li wê bûne mu'min, eya mustemi'.

Ne ku şey'ikî jê tu înkar bikî,
Xwe bê dîn û ehlê cefayê bikî!

Bifikre di xelqê Xwedayê weha:
Ji erdê heta Sîdret-ul Munteha.

Ku îz'anêkî wê demê, zerreyek
Ji behra 'edem nayê bêbariyek.

## MEBHES-UL EÎMMETÎ

Mezahib çiharin, îmamê di wan
Li heqqîne her çarî bêşek bizan.

Ku Nu'man û Ehmed û hem Malikin,
Ji dînê mere Şafiiye rukin.

Îmamê meye Eş'erê ta Nehir,
Ebû Mensûrê Mawera-un Nehir.

'Eqîda ku ew herdu pê qaîlin,
Ewe heqqe, heftê û du batilin.

Heçî ku li ser wê 'eqîdê nebit,
Ji ehlê fesadê û bid'et dibit.

Welê ehlê qiblê tu kafir mezan,
Serîhî ku kufrê nebînî ji wan.

Dê razî nebî tu bi kufra kesî,
Li Îslam mûhibbanê lez key besî.

Tu enwa'ê sihrê mezane helal,
Mebêje kesî, "kafirê dînbetal".

Tucaran tu de'wa xwedayî meke,
Suqûta tu teklîfê îzhar meke.

Mulettex meke qet perê mushefan
Bi tiştê necis ’emd û hem mescidan.

Mu’eyyen li kes le’netê tu meke,
Li ehlê ’ezabê ’umûmen bike!

## MEBHES-UL TESEWWÛFÎ WEL EXLAQÎ

Ji emrazê dilrene ferze dewa,
Ku hirs û hesed, kîbr û ’ucb û riya!

Gelekbûna malêye pir lezkirin,
Li şolanê, tezyîn û hezjêkirin.

Bi rehgirtina mezheban û ’erin,
Temayî ji xelqê bexîlî kirin.

Gelek xwarin û şehwet û sû’ û zen,
Ji xelqê û cehla ’ewamê diken.

Derin ew ji dilre wekî ku vebin,
Di pêrane nefs û le’în çêdibin.

Mûretteb dibîtin li e’za, ji wan
Afatan, tu guh dêre xasê lîsan.

Kelamê di zêde, kelamê betal,
Xusûmet di heqqan mîra û cîdal.

Bi sun’et xeberdan û fehş û dujîn,
Li tiştani le’net, bi xelqê kenîn.

Sira xelqê gotin, derew der yemîn,
Xînaî jî, we'da derew, ey emîn!

Duezmanî yû xîbet û medh û zem,
Nemmamî, herîfîkirin dem bi dem.

Sû'alê di zêde cewaba 'ewam,
Nezanîna xet'ê di fehwa kelam.

'Îlaca evane xeber qet nedan,
Mûdamî zikirkî bi qelb û lîsan.

Tu dermanê hirsê qena'et bizan.
Ji mehsûdîre bêje medh û du'an.

Ji avek mehînî tekebbur meke,
Tewadu' ji xelkê Xwedêre bike.

Ji şola çune, tu çi 'ucbê dikî?
Ji Xaliq nebîtin ne hedde bikî.

Qe nef'ek li te bê Xwedê nabitin!
Ji bil hebtê ta'et riya nakitin.

Tu, malê ji xwe zêde telbe meke!
Di şolande cehdê li sebrê bike!

Tu tezyînê bavê, bila te bivê,
Bi rehgirtina te xudanî nevê.

Di 'ernê, tu bîra xwe bîne le'în,
Sûalê meke j'xeyrî şahê Emîn!

Li xeyr û zekatê telefke tu mal,
Li birsînê cehdê bike mah û sal.

Mirovê ne mehrem, tu têkil mebe,
Mijûlî ji 'eyba xwe pirrtir mebe.

Sû'alê ji mahir-fihûlan bike,
Dewayê di lazim evin zebt bike.

Ji ferzane te'lîmîdana evan,
Li ebb û li cedd, seyyîd û mûde'an.

Wesî yû qeyyim, multeqit, muste'îr,
Îmam û xizim, salih û destegîr.

Ji ew paş ku zanî te ev wacibat,
Tu guh dêre şolê di mustehsenat.

Tesewwur di vê 'alemêde bike,
Bi dil-can tu xellaqê wê nas bike.

Mûcerred bike qelbê xwe j'masîwan,
Li ber wî tune tu bibîne ewan.

Ji fikrê û zikrê xwe xafil meke,
Ricayê û xewfê ji wî her bike.

Rî'ayet bike emr û nehyê di wî,
Ku îhsan û lutfê bibînî ji wî.

Wekî kıı digel wî tu gavek biçî,
Digel te gelek têtî ey multecî.

Di nefsa xwede jî tefekkur bike,
Ji avek tu ne çêbûyî, lec meke.

Çiqa ku tu nefsê tune 'ed bikî,
'Ulûwwa meqamê xwe hasil dikî.

Qe şolek ji wî ra hebî tu mepirs,
Eger ta'etê jî bikî, jê bitirs!

Dibîtin te meşxûlê xeyrê biket,
Ji heqqan û ferzan te xafil biket.

Heçî qenciya ku tu xalis bikî,
Ewe ê ji bo xwe mûheyya dikî.

Ku qencî kete qelbê te lez bike,
Xerabî ji şeytaniye, wê meke.

Ku "nefsa emmare" mutî'î neket,
Bi mewtê bitirsîne, wê tewbeket.

Bibêje: Xwedê te tecella bûye,
Qiyamet li te vê demê rabûye.

Tu îbret ji xelqê di ber xwe bigir,
Ewî mal û cahî qe nef'ek nekir.

Ji ew paşê lewmê li te ew diket,
Weha renge îlhama xeyrê diket.

Li ser qenciyê mutmeîn jî dibit,
We razî û merzî û kamil dibit.

Eger ew ji rehma wî bêhêviye,
Bibêje, ku "rehma Xwedê hed niye".

Ji Rebbê xwe xufranê telbe bike,
Bi tewbê tu paqij dibî, her bike.

Ji îsyanê ferze tu zû tewbekî,
Biterkî, gunahê di xwe pirr nekî.

Ewe tewbeya te peşîman bibî,
'Ezimkî, tucaran lê 'ewde nebî.

Edake heçî ku li ser te hebî,
Çi heqqê Xwedê bit çi yê ademî.

Mucerred bibe ger tewekkul heye,
We ger ne, tu kesbê bike xunmeye.

Eger dewlemendek qewî şakirî!
Çikî tu ji fiqra digel sabirî?

Ji bo te gelek terzî ew çêtire
Welêkin bi heddê xwe derve mere!

Li fê'la Xwedê î'tirazê meke,
Bi qencî, xerabî jê behsê meke.

Tu hingav Xwedayê xwe hez jê dikî
Ku dinyayê bavêjî, hez jê nekî.

Ewê cîfeyê tu neşî terk bidey,
Wekî vane wesfê, biçe, der bidey.

Ji min guh didêrî tu, mewsûfîbe
Bi van û muhîbbê Xwedayê xwebe.

Kesîr-ul heyabe, qelîl-ul eza!
Kesîr-us selahî, hemîd-ul eda!

Qelîl-ul fesad û kesîr-ul ‘emel,
Sedûq-ul lîsanî qelîl-uz zelel!

Qelîl-ul kelamî qelîl-ul fuzûl,
Weqûrun, sebûrun we berr-ul usûl.

Rediyyun, şekûrun, helîmun refîq!
Heşşaşun, beşşaşun, ’efuwwun şefîq!

Ne lewwam û sebbab û nemmam heqûd,
Ne muxtab, bexîl û ’ecûl û hesûd.

Muhîbbun lî Rebbîhî, mubxîz lehû,
Letîf-ul kelamî lî men tehtehû.

Qelîl-ul xîlafî we zû me’zîrat,
Bi însafîbe, muhsîn-us seyyîat.

Ferîdun bi eybîh, ’en-îl ’alemîn.
Rehîmun şefîqun ’elez-zalimîn.

Tu hilmê bike bê hed û bê qiyas,
Wekî munkerek te nebîtin ji nas.

Eger ku te ew dî muqata dike,
Tu canê bide, yane zail bike.

## MEBHESUT-TE'ELLUMÎ FÎ SEBÎLÎLLAH

Ji 'ilmê bixwîne heçî wacîbat,
Hedîsan û tefsîr û hem fiqhiyat.

Weha renge 'ilmê 'îlaca dilê,
Di gel Serf û Nehwê qira'et welê.

Heçî ku dixwînî ji bo Wî bixwîn,
Ji tedrîs û rutba dinêre mexwîn.

Tu dersê didî hem ji bo Wî bide,
Ji bo xizmet û tem' û fexrê mede!

## MEBHESU WEZAÎF-UL E'ZA-ÎL SEB'ETÎ

Te e'zaî heftin Xwedê çêkirî,
Ku pê sed bikî dergehê agirî.

Li kesba heramê çira der didî?
Wedî'a Xwedê ne tu zayi' didî!

Heçî layiqê Rebbe, wana bike,
Ku şehde nedin ew, 'îtabê bike.

Heçî ni'meta wî li te daniye,
Ewê pê bike, her ku 'ebdîniye.

Ji bo çi tu vê le'b û lehwê dikî?
Heçî ku bi nef'e çire dê nekî?

Ewî, çavî daye ku pê bifkirî,
Di vê 'alemê 'ibretê jê girî!

Temmettu' ji dunyayê jî pê bikî,
Ewe şukrê wî ku nezer pê bikî.

Nezer ku herame heçî ku bike,
Ji fehmê û hifzê xwe bê hez dike.

Guhe bo sema'a li we'z û hedîs
Weha renge Qur'an û nutqa selîs.

Ewe ta'etê wî tu mehfûzîkey,
Xeberdan û dengê neçê, guh nekey.

Ewe nef'ê ezmanê te ey zekî,
Ku carek bixwînî bi wî 'ilmekî.

Weha renge Qur'an û we'z û zikir,
Hedîsan û emran û nehy û şukur.

We hem pê bibînî umûrê di xwe,
Ji muhtacî yû bey' û rehnê di xwe.

Ewe ta'etê wî ku zayi' nekey,
Derewan û fehşê û zem pê nekey.

Gelek ev muzirin, nexesma lîsan,
Ewe yê te waqi' diket der ziyan.

Zikê te te'amê dixwe hel diket,
Di 'uzwande xwîn û menî pirr diket.

Bi xwînê, tu tehsîla ta'et dikî,
Bi ya dî, biçûkan ê peyda dikî.

Dibînî bi wê, lezzeta xwarinê,
Weha renge bid'an û vexwarinê.

Ewe ta'etê wî heramî nexwî,
Ji neh pariya zêdetir jî nexwî.

Ewe nef'ê fercê cîma'ê bikî,
Weled jê bibin, lezzetê jê bikî.

Zinayê meke, her ewe şukrê wî,
Welê çav û dil dê hifizkin ewî.

Bi dest û piyane rizaya Xwedê,
Gelek meslihet jê ku nayên hedê.

Bi destê heramî kîtabet meke,
Li nik zalimîve qe meşyê meke.

Dile hakimê van, tu tahir bike,
Ji rêve dewayê li wî her bike.

## MEBHESU ADAB-ÎL EKLÎ

Xwedê ev te'amê di xweş dane te,
Digel av û fêkî, libasê li te!

Tu, bêşukrî manendê heywan mexwe!
We bê mulheza wî tu tiştek mexwe!

Bixwe tu ji bo quwweta ta'etê,
Ne bo lezzet û keyf û pirr şehwetê.

Ji bo xwe hevalan-i peyda bike
Ji bo xwarinê, paşê dest pê bike!

Di ber zadî, paşê jî destan bişo!
Wekî ku bi kefçik bixwî, qet meşo!

Li ser zadî rûne bi terzek edeb,
Piyê rastê rake û razîne çep.

Ne razê, ne palde dema xwarinê!
Ne bêhişbe ba fexr û pirr xwarinê!

Hinik xwê di ber zad û paşê bixwe,
Heramî û tiştê bi şubhe mexwe.

Ku goştgirtina te j'heramî bitin,
Du'ayê te êdî qebûl nabitin.

Heçî hate ber te tu pê razîbe,
Gelek talibê tiştê xweştir mebe.

Tu navê Xwedê bîne dest pê bike,
Wekî ku rihabûyî, hemdê bike.

Tu "Elhemd" û "Îlaf" û "Îxlas" bixwîn,
Du'ayê di merwî jî bê hed bixwîn.

Ji ewwelve sarke, kelakel mexwe,
Ji nav hindî jorê firaxê mexwe!

Serê xwe mebe ser firaxê tucar!
Tu bêterziyê qet meyîne diyar!

Heçî ku li ber te hebî wî bixwe!
Li ber hemneşînê xwe zadê mexwe!

Biçûk çêke luqman û qenc hel bike,
Nezer b'alî luqma hevalan meke!

Bi nanî tu destê xwe paqij meke!
Bi kêrê û destek tenê ker meke!

Heta ku tu luqma ewil hel nekî,
Ne terze, tu luqma duwê çê bikî!

Hilîne heçî hûr bûyî ber piyan,
Ewe mehre bêşek ji bo horiyan!

Ji mêhvanîre nê edeb pirrtirin,
Ji bo te çi bêjim ji heddê derin.

Tu rûne bira, paşê avê vexwe,
Sê caranî bihnde, bi mêhtin vexwe!

Bi navê Wî hercarî dest pê bike,
Li nik axirê wan tu hemdê bike.

Ji fêkî tu burhê bide ê şîrîn,
Ji bo te dewain, wekî hingivîn!

## MEBHESUL EL LÎBASÎ

Lîbasê ji bo fexr û kibrê mepoş,
Mucerred ji bo ta'etê wî bipoş.

Heramî û dîbac û qez ber meke!
Bi wan ta'etê xwe tu berze meke!

## MEBHESU ADAB-ÎL SELATÎ

Ji bo te Xwedê çêkirin ev nimêj,
Ewin yê nehêlin bibî tu qirêj.

Tu erkan û şertê di wan zebt bike,
Heman weqtê wê hat û lez lê bike.

Tu rabe nimêjke bi qelbek kuşad,
Bi tirs û bi hêvî, eya ze-r reşad.

Bi te'zîm û heybet, huzûr û heya,
Tedebbur bike d'xwendin û hem dû'a.

Gelek minnetê hilgire tu ji wî,
Ku îzna te daye, tu daxîvî wî.

Bike rû, evî qalibê cewherî,
Bide wî Xwedayê ku ew çêkirî.

Hisabke Xwedê te li wê hazire,
Li yumnaye cennet, li çep agire.

Bitirse, ne ku qelbê xafil bikî,
Bi xwe xwe û sezawarê qehrê bikî.

Wekî ku rihabûyî dilşadîbe,
Li tewfîqê Barî şukurdarîbe.

Di pêve du'ayê di merwê bike,
Nimêja xwe jî her cema'et bike.

Li ku dest dide bo te ev terzê genc,
Ku pertalê xwe tu bikî bîstûpenc?

Bi esehh rîwayet bûye bîst û heft,
Çi xweş dewlete, ni'metek derbînext.

Wekî ji ferzkî xwe rihabûyî tu,
Ji ferza dû wêre mûheyyabe tu.

Ji subhê heta tavê zikrê bike,
Ji bo xwe hec û 'umreyek kesb bike.

Heçî ku me gotî bi dil guh bidê,
Ewe her riya te, emanê medê.

Kelamek selîse bi cih zebt bike,
Ewe yê ji wertê te xaric dike.

Xelîlî ku ev terz bida'et nebû,
Welê ew bi fermana exxê xwe bû.

"Du sê lefzî gotin ji bo zarûwan,
Ku xwe pê vedin ew ji xerba ziyan".

Ewî navî lê danî "Nehc-ul Enam"
Welêkin ku pê muntefi' bin 'ewam.

Eya wa'izê zu-l fesad û helak!
Tu hemdê Xwedêke 'ela ma hedak.

Îlahî digel me bi lutfa xwekî,
Heçî ku sewabe muyesser bikî.

Me nespêrî nefsa me ya bed 'emel,
Ewe yê me waqi' diket der zelel.

Çiqa ku dimînin di qeyda heyat,
Di gel me ewî ke ku 'eynê necat.

Nebî pêşê destê xwe me y'rûsiyah,
Nizanin emê dê çi bêjine Şah!

Di yewm-il Qiyame me dilşad bike,
Di yumna Muhemmed me derbaz bike.

Gelek hêvîkarê lîqaya teyîn,
Me bê behr û muflis nekî, bendeyîn.

Me û da û babê hemî mu'minan,
Digel ê ku bo me bibêjit du'an.

Efûkî îlahî bi sidq û sefa,
Bibî Cennetê tabi'ê Mustefa.

وَكِي كُو رِهَا بُوِي دِلْ شَادِ بَه　　لِتَوْفِيقِ بَارِي شُكْرْ دَارِ بَه
دِ پِيڤَه دُعَايِ دِ مَرْوِي بِكَه　　نَمِيژَا خُوَ ژِي هَرْ جَمَاعَتْ بِكَه
لِكُو دَسْتْ دِدَه بُوتَه اَڤْ طَرْزِ گَنْجْ　　كُو بَرْتَالِ خُو تُو بِكِي بِيسْتْ وَپَنْجْ
بِاَصَحْ رِوَايَتْ بُوِيَه بِيسْتُ وَهَفْتْ　　چِه خُوشْ دَوْلَتَه نِعْمَتَكْ دَرْبِ تَخْتْ
وَكِي ژِ فَرْضِكِي خُو رِهَا بُوِي تُو　　ژِ فَرْضَا دُوِي رَا مُهَيَّابَه تُو
ژِ صُبْحِي حَتَا طَاڤِ ذِكْرِي بِكَه　　ژِ بُو خُو حَجُ وعُمْرَه يَكْ كَسْبْ بِكَه
هَچِي كُو مَه گُوتِي بِدَلْ گُوهْ بِدِي　　اَوَه هَرْ رِيَا تَه اَمَانِي مَدِي
كَلَامَكْ سَلِيسَه بِجِهْ ضَبْطْ بِكَه　　اَوَه اِي ژِ وَزْطِي تَه خَارِجْ دِكَه
خَلِيلِي كُو اَڤْ طَرْزِ بِضَاعَتْ نَبُو　　وَلِي اَوْ بِفَرْمَانَا اَخِ خُوَه بُو
دُوسِي لَفْظِ گُوتِنْ ژِ بُو زَارُوَانْ　　كُو خُوبِي قَدِنْ اَوْ ژِ خَرْبَا زِيَانْ
اَوِي نَاڤِ لِي دَانِي نَهْجُ الْاَنَامْ　　وَلِيكِنْ كُو بِي مُنْتَفِعْ بِنْ عَوَامْ
اَيَا وَاعِظِي ذُو الْفَسَادُ وَهَلَاكْ　　تُو حَمْدِ خُدِي كَه عَلَى مَاهَدَاكْ
اِلَهِي دِ گَلْ مَه بِلُطْفَا خُو كِي　　هَچِي كُو صَوَابَه مُيَسَّرْ بِكِي
مَه نَسْپِيرِي نَفْسَا مَه بِي بَدْ عَمَلْ　　اَوَه بِي مَه وَاقِعْ دِكَتْ دَرْ زَلَلْ
چِقَا كُو دِمِينِنْ دِ قَيْدَا حَيَاتْ　　دِ گَلْ مَه اَوِي كَه كُو عَيْنِ نَجَاتْ
نَبِي پِيشِ دَسْتِ خُو مَه ي رُوسِيَاهْ　　نِزَانِينْ اَمِي دِي چِه بِيژِينَه شَاهْ
دِيَوْمِ الْقِيَامَه مَه دِلْ شَادْ بِكَه　　دِ يُمْنَا مُحَمَّدْ مَه دَرْبَازْ بِكَه
گَلَكْ هِيڤِيكَارِي لِقَا يَا تَه يِينْ　　مَه بِي بَهْرُو مُفْلِسْ نَكِي بَنْدَه يِينْ
مَه وُ دَا وُ بَابِ هَمِي مُؤْمِنَانْ　　دِ گَلْ اِي كُو بُو مَه بِبِيژِتْ دُعَانْ
عَفُو كِي اِلَهِي بِصِدْقُ وَصَفَا　　بِبِي جَنَّتِي تَابِعِ مُصْطَفَى

ژِمِهڤَانِ رَانِ آدَبْ پِتر تِرِنْ          ژِبُوتَه چِه بیژِم ژِحَدِی دَرِنْ
تُو رُونَه بِرَا پَاشِی آڤِ ڤَخُوَه          سِی جَارَانِ بِهَنْ دَه بِهَتِنْ ڤَخُوَ
بِنَاڤِ وِی هَرْ جَارِ دَسْتْ پِی بِکَه          لِنِكْ آخِرَوَانْ تُو حَمْدِی بِکَه
ژِفِیکِی تُو بَرْهِی بِدَه یِی شِرِینْ          ژِبُوتَه دَوَائِنْ وَکِی هِنْگُفِینْ

## مَبْحَثُ اللِّبَاسِ

لِبَاسِی ژِبُو فَخْرُ وَ کِبْرِی مَپُوشْ          مُجَرَّدْ ژِبُو طَاعَتِ وِی بِپُوشْ
حَرَامِی وُ دِیبَاجُ وَ قَزْ بَرْ مَکَه          بِوَانْ طَاعَتِ خَوْ تُو بَرْزَهْ مَکَه

## مَبْحَثُ آدَابِ الصَّلَاةِ

ژِبُوتَه خُدِی چِیکِرِنْ اَڤْ نِمِیژْ          اَوُنْ بِی نَهِیلِنْ بِبِی تُو قِرِیژْ
تُو اَرْکَانُ وشَرْطِی دِوَانْ ضَبْطْ بِکَه          هَمَانْ وَقْتِ وِی هَاتُ وَلَزْلِی بِکَه
تُو رَابَه نِمِیژْکَه بِقَلْبَكْ کُشَادْ          بِطِرْسُ و بِهِیڤِی اَیَا ذَا الرَّشَادْ
بِتَعْظِیمُ وَهَیْبَتْ حُضُورُ وَحَیَا          تَدَبُّرْ بِکَه دِ خَوَنْدِنُ وَهَمْ دُعَا
گَلَكْ مِنَّتِی هِلْگِرَه تُو ژِ وِی          کُو اِذْنِ تَه دَایَه تُو دَاخِیڤِ وِی
بِکَه رُوَا اَڤِی قَالِبِی جَوْهَرِی          بِدَه وِی خُدَایِ کُو اَوْ چِیکِرِی
حِسَابِکَه خُدِی تَه لِوِی حَاضِرَه          لِیُمْنَایَه جَنَّتْ لِچَپْ آگِرَه
بِطِرْسَه نَه کُو قَلْبِ غَافِلْ بِکِی          بِجُوَه خُوَ سَزَاوَارِ قَهْرِی بِکِی

## مبحث آداب الاكل

خدى اڤ طعامى دخوش دانه‌ته     دگل اڤ وفيكى لباس لته
تو بى شكر ماننده حيوان مخو     وبى ملحظاوى تو تشتك مخو

بخو تو ژبو قوتا طاعتى     نه بو لذت و كيف و بو شهوتى
ژبو خو هڤالان پيدا بكه     ژبو خوارنى پاش دست پى بكه
دبرزادى پاشى ژى دستان بشو     وكى كو بكفچك بخوى قط مشو
لسر زادى رونه بطرزك ادب     بپى راستى راكه و رازينه چپ
نه رازى نه پالده دما خوارنى     نه بى هشبه بافخر و بر خوارنى
هنك خوى دبر زادو پاشى بخو     حرامى و تشتى بشبهه مخو
كو گوشتگرتنا ته ژحرامى بتن     دعاى ته ايدى قبول نابتن
هچى ها نه برته تو پى راضى به     گلك طالب تشتى خوشتر مبه
تو ناڤ خدى بينه دست پى بكه     وكى كو رهابو پى حمدى بكه
تو الحمد و ايلاف و اخلاص بخون     دعايى دمروى ژى بى حد بخون
ژاولڤه صاركه كلاكل مخوه     ژناڤ هندى ژورى فراغى مخوه
سر خو مبه سر فراغى تو جاز     تو بى طرزى قط مبينه دياز
هچى كو لبرته هبى وى بخوه     لبر همنشين خو زادى مخوه

بچوك چيكه لقمان و قنج حل بكه     نظر بالى لقما هڤالان مكه
بنانى تو دستى خوه پاقژ مكه     بكيرى و دستك تنى كر مكه
حتا كو تو لقما اول حل نكى     نظرنه تو لقما دوى چى بكى
ملينه هچى هور بو پى برپياز     اوه مهره بى شك ژبو حورياز

اَوَنفع ازمانِ ته ای ذکی    کوجارک بخونی بوی علمکی
وها رنگه قرآنو وعظ و ذکر    حدیثانو وآمرانو ونهی و شکر
وهَم پی ببینی اموری دِ خو    ژ محتاجی و بیع و رهنی دِ خو
اوه طاعت وی کو ضایع نکی    دروانو و فحشی و ذم پی نکی
گلک اڤ مضرن نخوسما لِسان    اوه پی ته واقع دکت در زیان
زِ ک ته طعامی دِ خو حل دکت    دِ عضوان ده خون و منی پر دکت
بخونی تو تحصیل طاعت دکی    بیادی بچوکان پیدا دکی
دِ بینی بوی لذتا خوارنی    وها رنگه بضمانو و ڤخوارنی
اوه طاعت وی حرامی نخوی    ژنه پاریا زیده تر ژی نخوی
اوه نفع فرجی جماعی بکی    ولذژی ببن لذتی ژی بکی
زنائی مکه هر اوه شکروی    ولی چاڤ و دل دی حفظ کن اوی
بدستو و پیانه رضا نا خدی    گلک مصلحت ژی کونائین حدی
بدستی حرامی کتابت مکه    لنک ظالمی ڤه قه مشیی مکه
دله حاکم ڤان تو طاهر بکه    ژ ریڤه دوائی لوی هر بکه

توحلمی بکه بی حدو بی قیاس      وکی منکرک ته نبیتن ژ ناس
آگر کو ته او دی مقاطادکه      توجانی بده یانه زائل بکه

## مبحث التعلم فی سبیل الله

ژعلمی بخونه هچی وا جبات      حدیثان وتفسیرو هم فقهیات
وهارنگه علم علاجا دلی      دگل صرف ونحوی قرائت ولی
هچی کو دخونی ژبووی بخون      ژتدریس ورتبا دنی را مخون
تودرسی ددی هم ژبووی بده      ژبوخدمت وطمع وفخری مده

## مبحث وظائف الاعضاء السبعة

ته اعضاء هفتن خدی چیکری      کو پی سد بکی دزگهی آگری
لکسبا حرام چرا درز ددری      ودیما خدی نه توضایع ددی
هچی لائق ربه وانه بکه      کوشهده نه دن او عتابی بکه
هچی نعمتا وی لته دانیه      اوی پی بکه هر کو عبدینیه
ژبوچه توڤی لعب ولهوی دکی      هچی کو بنفمه چرا دی نکی
اوی چاڤ دایه کو پی بفکری      دڤی عالمی عبرتی ژی گری
تمتع ژ دنیای ژی پی بکی      اوه شکروی کو نظر پی نکی
نظر کو حرامه هچی کو بکه      ژ فهمی وحفظی خوبی حظ دکه
گوهه بو سماعا لوعظ وحدیث      وهارنگه قرآن ونطقا ثلیث
اوه طاعت وی تو محفوظ کی      خبرداو و دنگی نچه گوه نکی

ئَگَرَاوْ ژِرَحْمَا وِى بِى هِيڤِيَه     بِبِيژِه كُو رَحْمَا خُدِى حَدْنِيَه
ژِرَبِ خُوغُفْرَانِى طَلَبَه بِكَه     بِتَوْبِى تَوْيَا قِرْژِدِبِى هَرْ بِكَه
ژِعِصْيَانِ فَرْضَه تَوْزُو تَوْبَه كِى     بِتَرْكِى گُنَاهِى دِخُو پُرْ نَكِى
اَوَه تَوْبَه يَا تَه پَشِيمَانْ بِبِى     عَزِمْ كِى تُوجَارَانْ لِى عَوْدَه نَبِى
اَدَا كَه هَچِى كُو لِسَرْتَه هَبِى     چِه حَقْ خُدِى بِتْ چِه بِى آدَمِى

مُجَرِّدْ بِبَه گَرْ تَوَكُّلْ هَيَه     وَگَرْنَه تُو كَسْبِى بِكَه غُنْمَه يَه
اَگَرْ دَوْلَمَنْدَكْ قَوِى شَاكِرِى     چِه كِى تُو ژِفِقْرَا دِگَلْ صَابِرِى
ژِبُو تَه كِلَكْ طَرْزِ اَوْ چِيتِرَه     وَلِيكِنْ بِجَدِّ خُو دَرْڤَه مَرَه
لِفِعْلَا خُدِى اِعْتِرَاضِى مَكَه     بِقَنْجِى خَرَابِى ژِى بَحْثِى مَكَه
تُوهَنْگَاڤْ خُدَاىِ خُو حَرْژِى دِكِى     كُو دُنْيَاىِ بَاقِيْرِى حَزْژِى نَكِى
اَوِى جِيفَهُ تُو نَشِى تَرْكْ بِدَى     وَكِى ڤَا نَه وَصْفِ بِچَه دَرْ بِدَى
ژِمِنْ گُوَه دِدِيرِى تُو مَوْصُوفِ بَه     بِڤَانُ وَمُحِبِّ خُدَاىِ خَوَه بَه
كَثِيرُ الْحَيَا بَه قَلِيلُ الْأَذٰى     كَثِيرُ الصَّلَاحِ حَمِيدُ الْأَدٰى
قَلِيلُ الْفَسَادِ وكَثِيرُ الْعَمَلْ     صَدُوقُ اللِّسَانِ قَلِيلُ الزَّلَلْ
قَلِيلُ الْكَلَامِ قَلِيلُ الْفُضُولْ     وَقُورٌ صَبُورٌ وَبَرُّ الْأُصُولْ
رَضِىٌّ شَكُورٌ حَلِيمٌ رَفِيقْ     هَشَّاشٌ بَشَّاشٌ عَفُوٌّ شَفِيقْ
نَه لَوَّامْ وسَبَّاب ونَمَّامْ حَقُودْ     نَه مُغْتَابْ بَخِيلُ وعَجُولُ وحَسُودْ
مُحِبٌّ لِرَبِّهِ مُبْغِضٌ لَهُ     لَطِيفُ الْكَلَامِ لِمَنْ تَحْتَهُ
قَلِيلُ الْخِلَافِ وَذُو مَعْذِرَاتْ     بِاِنْصَافِ بَه مُحْسِنُ السَّيِّئَاتْ
فَرِيدٌ بِعَيْبِهِ عَنِ الْعَالَمِينْ     رَحِيمٌ شَفِيقٌ عَلَى الظَّالِمِينْ

مړوڅه نه محرم تو تیکل مبه  نڅولی ژغیبا خو پرتړ مسه

سؤالي ژما هر فحولان بکه  دواء دلازم اڅن ضبط بکه

ژفرضا نه تعلیم دا نا اڅان  لاب و لجد سید و مودعان

وصی و قیم ملتقط مستعیر  امام وخزم صالح ودستګیر

ژاوباش کوزانی ته اڅ واجبات  توګوه دیره شولي د مستحسنات

تصوز دڅ عالمي دا بکه  بدل جان توخلاق وی ناس بکه

مجرد بکه قلب خو ژما سوان  لبزوی تنه تو ببینه اوان

ژفکری وذکری خو غافل مکه  رجائی وخوفي ژوی هر بکه

رعایت بکه امر و نهی دوی  کو احسان ولطفي ببیني ژوی

وکی کو دګل وی تو ګا څك بچي  دګل ته ګلك تیت ای ملتجي

دنفسا خو داژی تفکر بکه  ژاڅك تنه چي بوي لج مکه

چقا کو تو نفسي تنه عذ بکي  علوا مقام خو حاصل دکي

قه شولك ژوی راهبي تو مبرس  اګر طاعتي ژی بکي ژی بطرس

دبیتن ته مشغول خیری بکت  ژحقان وفرضان ته غافل بکت

هچي قنجیا کو تو خالص بکي  اوه ای ژبو خو مهیا دکي

کو قنجي کته قلب ته لز بکه  خرابي ژشیطانیه وی مکه

کو نفسا اماره مطیعي نکت  بموتي بطر سینه وی توبه کت

ببیژه خدی ته تجلي بویه  قیامت لته ڨي دمي رابویه

تو عبرت ژخلقي دبزخو بکر  اوی مال وجاهي قه نفعك نکر

ژاو باش لومي لته او دکت  وها رنګه الها ما خیری دکت

لسر قنجي مطمئن ژی دبت  وراضي ومرضي وکامل دبت

## مَبحثُ التَّصوُّفِ وَالأَخلاَق

ژِ أَمرَاضِ دِلْ رَانِي فَرضَه دَوَا      كو حِرص و حَسَدْ كِبرُ و عُجبُ و رِيَا
گلك بُونَا مَالِ يَه پُرْ لَزْ كِرِنْ      لِشُولَانِ تَزيِينُ و حَزْ ژِي كِرِنْ
بِرْهِكِرِ تِنَا مَذهَبَانُ و عَرِنْ      طَمَا عِي ژِ خَلقِ بخيلي كِرِنْ
گَلَكْ خُوارِنُ و شَهوَتُ و سُوءِ ظَنْ      ژِ خَلقِ و جَهلَا عَوَامِ دِكَنْ
دَرِنْ آوْ ژِ دِلْ رَا وَكِي كُو قَبِنْ      دِپِيرَانِ نَفسُ و لَعِينْ چِي دِبِنْ
مُرَتَّبْ دِبِيتِنْ لِاَعضَا ژِوَانْ      آفَاتَانْ تُو كُهْدِيمْ خَاصِي لِسَانْ
كَلَامِي دِزِيدَه كَلَامِي بَطَالْ      خُصُومَتْ دِحَقَّانْ مِرَاءُ و جِدَالْ
بِصُنعَتْ خَبَرْدَانُ و فَحشُ و دُژِينْ      لِتِشْتَانِ لَعنَتْ بخلقِ كَنِينْ
سِرَا خَلقِ گُوتِنْ دَرَوْ دَرْ يَمِينْ      غِنَا بُ ژِي وَعْدَا دَرَوْ اَيْ اَمِينْ
دُوآزْمَانِي وَ غِيبَتْ و مَدحُ و ذَمْ      نَمَامِي حَرِيفِي كِرِنْ دَمْ بِدَمْ
سُؤَالِي دِزِيدَه جَوَابَا عَوَامْ      نَزَانِينَا خَطِئِ دِنَحْوَا كَلَامْ
عِلَاجَا اَفَانَه خَبَرْ قَطْ نَدَانْ      مُدَامِي ذِكرِ كِي بِقَلبُ و لِسَانْ
تُو دَرْ مَانِ حِرصِي قَنَاعَتْ بِزَانْ      ژِ مَحسُودِرَا بِيژَه مَدحُ و دُعَانْ
ژِ آفَكْ مَهِينِي تَكَبُّرْ مَكَه      تَوَاضُعْ ژِ خَلقِ خُدِي رَا بِكَه
ژِ شُولَا چُو نَه تو چه عُجبِي دِكِي      ژِ خَالِقْ نَبِيتِنْ نَه حَذَه بِكِي
قَه نَفعَكْ لِتَه بِي خُدِي نَابِتِنْ      ژِ بِلْ حَبطِ طَاعَتْ رِيَا نَاكِتِنْ
تُو مَالِي ژِ خَوه زِيدَه طَلَبه مَكَه      دِشُولَا نَدَه جَهْدِي لِصَبرِي بِكَه
تُو تَزيِينِ بَاقِي بِلَا تَه بِقِي      بِرْهِكَرْتِنَا تَه خُدَا نِي نَقِي
دِعَرْنِي تُو بِيرَا خُو بِينَه لَعِينْ      سُؤَالِي مَكَه ژِ غَيرِ شَاهِي آمِين
لِخَيرُ و زَكَاتِي تَلَفكَه تُو مَالْ      لِبِرسِين جَهْدِي بِكَه مَاه و سَالْ

وَهَا رَنگَه تِشتِي وَه كُو مُجتَمِعْ — لِوِي بُونَه مُؤمِنْ أَيَا مُستَمِعْ
نَكُو شَيئِكِي ژِى تُو اِنكَارْ بِكِي — خَوِه بِي دِينُ وَاَهْلِ جَفَائِي بِكِي
بِفِكرِهِ دِ خَلقِ خُدَايِ وُهَا — ژِ عَرْدِى حَتَا سِدْرَةُ الْمُنتَهَى
كُو اِذْ عَانِ كِي وِى دَمِي ذَرَّه يِكْ — ژِ بَحْرَا عَدَمْ نَا يِ بِي بَارِ يِكْ

## مَبْحَثُ الْاَئِمَّةِ

مَذَاهِبْ چِهَارِنْ اِمَامِ دِوَانْ — لِحَقِينَه هَرْ چَارِ بِي شَكْ بِزَانْ
كُو نُعْمَانُ وَاَحْمَدُ وَهَمْ مَالِكِنْ — ژِ دِينِ مَه رَا شَافِعِيَّه رُكُنْ
اِمَامِي مِيَه اَشْعَرِى تَا نَهِرْ — اَبُو مَنْصُورْ اِى مَاوَرَاءُ النَّهرْ
عَقِيدَا كُو اَوْ هَرْدُو بِي قَائِلِنْ — اَوَه حَقَّه هَفْتِي وُ دُو بَاطِلِنْ
هَچِي كُو لِسَرْ وِى عَقِيدِى نَبِتْ — ژِ اَهْلِ فَسَادِى وُ بِدْعَتْ دِبِتْ
وَلِي اَهْلِ قِبْلِي تُو كَافِرْ مَزَانْ — صَرِيحِي كُو كُفْرِى نَبِينِي ژِوَانْ
دِ ى رَاضِى نَبِي تُو بِكُفرَا كَسِى — لِاِسْلَامْ مُجْتَانِ لَزَكَى بَسِى
تُوانْوَاعِ سِحْرِى مَزَانَه حَلَالْ — مَبِيژَه كَسِى كَافِرِى دِينْ بَطَالْ
تُو جَارَانْ تُو دَعْوَا خُدَايِي مَكَه — سُقُوطَا تُو تَكْلِيفِ اِظْهَا زْ مَكَه
مُلَطَّخْ مَكَه قَطْ پِرِ مُصْحَفَانْ — بِتِشْتِي نَجِسْ عَمْدَ هَمْ مَسْجِدَانْ
مُعَيَّنْ لِكَسْ لَعْنَتِي تُو مَكَه — لِاَهْلِ عَذَابِي عُمُومَا بِكَه

## مَبحَثُ سُؤَالِ القَبرِ وَمَبحَثُ القِيَامَةِ

عَذَابُ وسُؤَالَا دِقَبرِى حَشر — حِسَابُ وصِرَاطُ و مِيزَانُ ونَشر
دِگَل جَنَّتُ وحَوضُ ونَارِحَقِن — وُهَا رَنگَه چَاڤُ و سِحِرزِى حَقِن
لِاَسمَانِ هَفتِ يَه جَنَّتْ نِهَا — جَهَنَّمْ لِبِنْ اَرضِ يَه هَر وُهَا
دِگَلْ هِندِى اَشيَا فَنَادِى بِبِنْ — ژِبِلْ ذَاتِ رَب پَاشِى عَودَه دِبِنْ
دِى اَجزَاءِ جِسمِى فَنَابِنْ ژِبِنْ — ژِبِلْ عَضمَصِى پَاشِى مَحشُورِبِنْ
خُدِى دِى اَوَانْ فَانِيَانْ عَودَه كَنْ — بِمَرضَا حِسَابَا خَوهْ حَاضِربِكَت
دِرِيژكَتْ صِرَاطِى لِسَر آگِرِى — وضِعْ كَتْ شَهِينِى لِدُوڤِ پُرِى
بِدِتْ دَستِ رَاستِى كِتَابَا هِنَانْ — بِدَستِ چَپِى پِى هِنَانْ بِى گُمَانْ
حِسَابَا گُنَاهَانْ ژِخَلقِ بِكَتْ — خَرَابَانُ وقَنجَانِ پِى فَرقْ بِكَتْ
اَڤَانْ دِى بِفَضلَا خَوه دَربَازِكَتْ — اَوَانْ دِى دِنَارِيدَه وَاقِعْ بِكَتْ
حَيچِى جَنَّتِى دِى ژِحَوضِى ڤَخُونْ — هَمِى جَهنَمِى هَر حَمِيمِى ڤَخُونْ
گُنهكَارِ پَاشِى دِى ژِى دَركَڤِنْ — تُوجَارَانِ كَافِر بِدَرنَاكَڤِنْ
ظُلمْ نِينَه عَدلَه هَچِى كُو بِكَتْ — دِمُلكِى خَوه دَه اَوْ تَصَرُّفْ دِكَتْ
لِهَرَيكْ ژِمَه كَافِرِكْ وِى هَيَه — بِفَضلَا خُدِى اَوْ فِدَاىِ مَه يَه
مُرُوڤِ گُنَاهِى مَزِنْ هَر كِرِى — مُحَقَّقْ نِهِنْ اَوْ ژِبُو آگِرِى
مُعَذَّبْ دِكَتْ يَانَه آذَا دِكَتْ — ژِوِيرَانِ خَلْ ژِى شَفَاعَتْ دِكَت
ژِرِيڤَه مُحَمَّدْ شَفَاعَتْ چِيَه — دِپِيڤَه هَچِى كُو خُدَانْ قَنجِيَه
ژِبُو شَهدِى مَعنِى اَڤِنْ بِالتَّمَامْ — اَوِى لَفظِى مَشهُورِ بَينَ العَوَامْ
وَه نِينَه تُو بِى ڤَانِ مُؤمِنْ نَبِى — وَلِيكِنْ بِاِنكَارِ كَافِرْ دِبِى
چِكُو فَرضَه تَصدِيقْ بِكِى تُو بِرَا — بِمَا قَدْ اَتَانَا رَسُولُ الوَرَى

## مَبحَثُ الاِختيارِ الجُزئِي

خُدَا خَالِق جُمْلَه فِعْلَا نَه يَه      وَلِي اِخْتِيَارِي بِدَسْتِ تَه يَه

اَوَه مُبْدِع فِعْلِ كَاسِبْ تُوي      جَزَا كَارِ فِعْلَا كُو طَالِبْ بُوي

اَثَرْ كُو لِفِعْلِ مُرَتَّبْ دِبِتْ      بِاِيجَادُو فِعْلَاوِي پَيْدَا دِبِتْ

دِشِيتِنْ وَ بِي فِعْلِ پَيْدَا بِكِتْ      كُو بِي چَاڤُ وكُورَانِ بِينَا بِكِتْ

اَوِي فِعْلِ جُمْلَه دِبِي عِلَّتِنْ      وَلِيكِنْ نَه خَالِي ژِ مَصْلِحَتِنْ

اَجَلْ هَرْ يَكَه گَرچِه كُشْتِنْ بِتِنْ      قَه شُولَكْ لِوِي نَابَه وَاجِبْ بِتِنْ

وَكِي كُو لِتَه اَوْ نِكِتْ شَفْقَتِي      تُو نَاچِي بِهِشْتِي سَبَبْ طَاعَتِي

وَلِي فَرْضَه دَائِمْ تُو طَاعَتْ بِكِي      رَجَا اُ قَبُولِي ژِوِي هَرْ بِكِي

حَرَامْ هَرْ وَكِي حِلِّ رِزْقَه ژِوِي      اَگَرْچِه مُعَقَّبْ دِكِتْ تَه بِوِي

تَنَاسُخْ ژِبُو رُوحْ حُلُولَا خُدَا      تُو نِينِنْ اَيَا مُؤْمِنِي جَانْ فِدَا

## مَبحَثُ عَلَامَاتِ السَّاعَةِ

عَلَامَتْ ژِبُو سَاعَتِي رَاپِرِنْ      بِكُلْ ژِ فَرْضَانَه بَاوَرْ كِرِنْ

ظُهُورْ بُونَا مَهْدِي خُرُوجَا دَجَّالْ      دِي نَازِلْ بِي عِيسٰى ژِبُو ذِي الضَّلَالْ

عَمَلْ دِي بِشَرْعَا نَبِيِّ مَه كَتْ      خَرَاجِي وُدِينِ فِلَانْ بَرْ نَه كَتْ

ژِپَاشْ هَفْتِ سَالَانْ نَقَلْ دِي بِتِ      دِقَبْرَا نَبِيِّ مَه مَدْفُونْ بِبِتْ

وَيَاْجُوجُ وَمَاْجُوجْ كُو پُرْ هَيبَتِنْ      دِگَلْ دَابَّةِ الْاَرْضِ رُوژْ دَرْكَتِنْ

ژِ مَغْرِبْ ڤَه اَوْ كُو ژِوِي دَرْكَفِتْ      دَرِ تَوْبَهْ دِي لِمَه دَاكَفِتْ

حَدِيثَا دَجَّالِي هَمِي حِفْظِ كِنْ      مُدَامِي ژِ فِتْنَاوِي تَعْوِيذِ كِنْ

## مَبْحَثْ عَدَدِ الاَنْبِيَاءِ

چهارُوصَدُوبِیسْتْ هَزارِنْ نَبِيْ    رُسُلْ سِیصَدُوسِیزدَهِنْ اَیْ اَبِيْ

دِقُرآنِ بیستِنْ دِگَلْ هَشْتِ دِیْ    کُتُبْ صَدْ تَمَامِنْ دِگَلْ چَارِدِيْ

ژِوَانْ هَرْچِيْ تِشْتِيْ کُوخَارِجْ دِبِيْ    نَهْ پِیسَه اَلَمْ بَلْکِيْ پِيْ خَوْشْ دِبِيْ

نَهْ اَهْلِنْ گُنَهْکَارُوعَیْبْدَارُو ژِنْ    ژِپَیْغَمْبَرْیَرَا وَلِيْ قِسْمِ ژِنْ

دِبِنْ کُووَلِيْ بِنْ کَرَامَاتِ وَانْ    دِدُنْیَایِ حَقِّنْ مَبَه ضِدِّوَانْ

## مَبْحَثْ تَأْثِیرِالدُّعَاءِ

دُعَایَانِ بِيْ شَكْ اَثَرْبُوهَنَه    ژِدَفْعَا بَلاَئِيْ رَا هِنْگَامَنَه

خَوشِنْ خُضْرُوالیَاسِ هَرْفِيْ دَمِ    نَبِینَه لِدَرْدَانْ دِکِنْ مَلْهَمِيْ

دِلُقْمَانُ وَاِسْکَنْدَرِیْ لَجْ مَکَه    نَه پَیْغَمْبَرِنْ وِیْ عِنَادِیْ مَکَه

## مَبْحَثْ نَصْبِ الاِمَامِ

ژِفَرْضَانَه نَصْبَا اِمَامِيْ کُودِیْنْ    حِفِظْکِتْ ژِمَظْلُومِ رَابِتْ مُعِیْنْ

حَرَامَه لِخَلْقِ خُرُو جَالِوِيْ    اَگَرْچِه کُوجَوْرِيْ بِبِینِنْ ژِوِيْ

## مَبْحَثُ التَّفَاضُلِ

وَلِى نَصّ دَالِنْ لِفَضْلَا هِنَانْ    ژِبُوتَه بِبِيژِمْ هَمِى اَفْضَلَانْ
اِبْرَاهِيمُ و مُوسٰى وَعِيسٰى وَنُوحْ    بِتَرْتِيبِ اَفْضَلْتِرِنْ پَاشِ نُوحْ
رَسُولِنْ لِدُو وَا نَزَا پَيْغَمْبَرِنْ    دِپِيڤَه خَوَاصِ مَلَكْ بِهْتِرِنْ
ژِعَامِى مَلَكْ فَنْجِتِرِنْ اَىْ جُوَانْ    ژِنِى دُنْيَوِى چيتِرِنْ ژِحُورِيَانْ
ژِهِنْدِى ژِنَانْ فَاطِمَه پِيڤَه دَا    لِدُو عَائِشَه نَرْهَچِى مَا بُوڤ
اَبُو بَكْرِ اَفْضَلْتِرِى اُمَّتِى    دِكُفْرِى نَبُورَا نَدِى يَكْ سَاعَتِ
لِپِيڤَه عُمَرْ اِى كُو نَاڤْ دَا پِيَه    بِفَارُوقِ عُثْمَانْ لِپَاشِ وِيَه
لِدُو وِى عَلِى صَاحِبِى ذُوالْفَقَارْ    اَڤَانَانِ سِهْ سَالْ خِلَافَتْ بُوَارْ
لِپَىْ ڤَانَه سَعْدُو زُبَيْرُ و سَعِيدْ    دِگَلْ عَبْدُ الرَّحْمٰنِ بُويَه شَهِيدْ
دِگَلْ طَلْحَةَ و بُو عُبَيْدَه بِزَانْ    كُو عَشْرُ الْمُبَشَّرْ بُويَه نَاڤِ وَانْ
سَبَبْ وِى كُو مِزْگِينِيَا جَنَّتِى    ژِبُو وَانِ هَاتِى ژِنِكْ حَضْرَتِى
هَمِى اَهْلِ بَدْرُو اُحُدْ بَيْعَتِى    مُحَقَّقْ بُويَه دِى بِچِنْ جَنَّتِى
وُهَا رَنْگَه اَزْوَاجُ وعِتْرَا رَسُولْ    ژِاَصْحَابِ دِى رَايَه اِرْجِى دُخُولْ
ژِحَرْبَا صَحَابَانْ مَكِنْ قَالُ وقِيلْ    بِهِشْتِينَه هَمْ قَاتِلُ وَهَمْ قَتِيلْ
هَمِى دَاوُ بَابِ دِ پَيْغَمْبَرَانْ    بَرِينَه ژِاَنْوَاعِ كُفْرُ و شَرَانْ

## مَبحثُ شمائِلِهِ ﷺ

لوی قامتک معتدل بو لطیف — نه کرت و دریژ و نه ضخم و ضعیف
نه رش بو سپی صورکی اسمری — مدور بو وجه ورهین انوری
اوی چاڤ و برهی مکحل هبون — ژ ده طا ان شیبا وی نه زیده بون
بروژ و بشف هم لپیش و لپاش — وکی یک ددی حاشه انکار حاش

## مَبحثُ المِعراج

ژکعبا منور خدی لیلکی — بره مسجد الاقصی اولحظکی
همی انبیا لی جڤان وی دمی — لوی بو امام اوی عالمی
ژوی او بره سدرة المنتهی — بقاب دو قوسان ڤبالخوم کها
بروح و جسد ڤه اوی بر سوار — بچاڤ سر خوه خدی دی دوجار

## مَبحثُ الرُؤیَةِ

ددنیای کس ندی ژبل وی ندی — دعقبای مؤمن دبیژن مه دی
لوی او دبینن رب عالیه — ولیکن حقیقت نزانن چیه
بهندی رسولان ایمانی تو بین — تفاضل ژ بو وان لنک خو نبین

## مَبْحَثُ الْمَلٰئِكَةِ

مَلَائِكْ ژِبُو وِی هَنَه بِی عَدَدْ — مُدَامِی عِبَادَتْ دِكِنْ بِی مَدَدْ
هِنَكْ ژِی خَوَاصِنْ وَلِی هِنْ نَكِی — ڤِهُنَتِی كِرِی اَوْ ژِبُو شُولَكِی
عَنَاصِرْ چِهَارِنْ ژِوَانِنْ مَلَكْ — وَكِی اِنْسُ وجِنْ نُورَه قِسْمِ گَلَكْ
دِوَانُ ودِمَه آخُ وجِنَّانْ هَوَا — دِشَيْطَانِ نَارَه اَوِی بِی نَوَا
نَه مِيرُونَه ژِنْ بِی خَورُو ڤَخُوزِنْ — لِشَكْلَانِ قَادِرْ بِچِنْگْ وپِرِنْ
فَنَا دِی بِبِنْ اَوْ بِچِنْ جَنَّتِی — ژِبُو اَهْلِ وِيرَا بِكِنْ خِذْمَتِی

## مُبْحَثُ الرِّسَالَةِ

مُحَمَّدْ رَسُولِ خُدَايَه هِنَارْ — ژِبُو اِنْسُ وجِنُّ ومَلَكْ پِيشْوَارْ
بِدِينِ وِی دِينِ ذِی مَنْسُوخْ بُونْ — كَمَالُ وفَضْلْ بُومَه بِی زِيدَه بُونْ
خُدِی اَوْكِرَه خَاتَمِ اَنْبِيَا — وَلِيكِنْ اَوَه سَرْوَرِ اَتْقِيَا
اَوِی عَبْدُاللّٰهْ بَابَه دَا آمِنَه — مَدِينَه ومَكَّه مَوْلِدُ ومَدْفَنَه
ژِنَسْلَا قُرَيْشَه ژِتُخْمِ عَرَبْ — نُبُوَّتْ دِسَالَا چِلِی دَا بِی رَبْ
سِسِی دِی كُو بُورِينْ اَوْ بُو رَسُولْ — مَكَّه بُو خَوَه دَه سَالِ دِی كِرْ قَبُولْ
ژِمَكِّی كُو بَالِی مَدِينِی ڤَه چُو — لِوِی دَه بُوَارِنْ ژِدُنْيَا یِ چُو

## مَبحَثُ الصِّفَاتِ السَّبعَةِ القَدِيمَةِ

| | |
|---|---|
| صِفَاتِ دِ سَبعَه اَزَل وی هَنَه | نَه عَینَن نه غیرَن نَه وَك اِیڤ مَنَه |
| حَیَانَه دِ گَل عِلم و سَمع و بَصَر | اِرَادَت دِ گَل قُدرَتَا خَیر و شَر |
| مُرِیدَه ژِ بُو خَیر و شَرَّان وَلِی | رِضَا وی تونینَه بِشُولا نَلِی |
| اَوِی دِی کَلاَمِ بَسِیطی قَدِیمْ | حُرُوف و لُغَت حَادِثن اَیْ حَکِیمْ |
| بِقُرآنِ غَیرِوی مَنسُوخ بُون | کَمَال و فَضل بُومَه پِی زِیدَه بُون |
| حَتَا کُو قِیَامَت دِی هَر دُو هَبِن | دِعُقبَایِ خُوندَایِ وِی هَر هَبِن |
| صِفَاتِ کَمَالِی هَمِی رَب هَنَه | سِمَاتِ دِ نَقصِی نَه مَوجُودَه نَه |
| تُونَا ڤَان تو بِی شَرعِ لِی دَا مَنَه | ژِ نَهو یدُونَه نَاڤ وی زِیدَه نَه |
| ژِ کَنمَا عَدَم عَالَم آنِی وُجُود | بِڤِی وَجهِ اَحسَن وی شَاهِ وَدُود |
| تُو مَعدُوم و حَادِث بِزَانَه اَوِی | هَیُولِی تونینَه کُو عَالَم ژِوِی |

## مَبْحَثُ الصِّفَاتِ السَّلْبِيَّةِ

وُجُودَاوِی عَیْنَه ژِ بُوذَاتِ وِی ‌ ‌ ‌ ‌ نَه اَوَّلْ نَه آخِرْ نَه ضِدَّه اَوِی

نَه مِثْلُ وَ ظَهِیرُ وَ وَزِیرُ وَمَکَانْ ‌ ‌ ‌ ‌ نَه مَانِعْ مُعِینُ وَ جِهَاتُ وَزَمَانْ

نَه جِسْمُ وَنَه جَوْهَرْ نَه نُورُ وَعَرَضْ ‌ ‌ ‌ ‌ نَه ذُولَوْنُ وَمِقْدَارُ وَشِکْلُ وَمَرَضْ

نَه اَوْلَادُ وَزَوجَتْ نَه بَابُ وَنَه دَا ‌ ‌ ‌ ‌ نَه هَمْکُوفُ وَمَوتُ وَزَوَالَا خُدَا

نُصُوصِی کُودَا لِنْ لِشُو لَا مُحَالْ ‌ ‌ ‌ ‌ مُؤَنْکَه مَسِیرَه اَهْلِ ضَلَالْ

ژِ نَفْسَا تَه نِیزِیکْتِرِینْ تَیَه ‌ ‌ ‌ ‌ خَبِیرِ بِاَفْعَالُ وَقَوْلِ تَیَه

# نهج الانام

بسم الله الرحمن الرحيم وبه نستعين

## مَبحَثُ الفُرُوضِ العَينِيَّةِ

نوگوه دِيره نُطقُ وبيانا فصيح　　ژِ بو فرضُ عينانه مَردِ مليح

كو ايمانُ واِسلامُ وصومُ وصلاةْ　　لِسرمالِ دارا نه حجّ و زكاةْ

لِسرته ژِ فرضانه اى نورِ جانْ　　بزانى تو آركانُ وشرطى دِڤانْ

مَحِى حكم شرع تو مُحتاجِ بى　　ژِ بوزانيناوى دِ ى مُنقادِ بى

تو ايمانِ باوريا دِلْ بزانْ　　مُطيعْ بونه اِسلامْ بظاهِر بزانْ

ولكِنْ قه يكْ بِى يكى نا بِتِنْ　　مُسلمانى بِى هر دوانْ نا بِتِنْ

تو معناىِ شهدِى كو باور بكى　　تلفظْ آگر قادِرى بى بِكى

ژِ كفرِى تو بِى شكْ خوخارِجْ دِكى　　ولى اَصلِ دينى تو حاصِلْ دِكى

وكى كو دِگلْ وِى عملْ ژى بكى　　تو ايمانُ واِسلامِ كامِلْ دِكى

معانى ژِ بو وِى اڤنْ گوه بدِى　　تو معبودِ بالحق تونى ژِ بِلْ خدِى

# نَهجُ الانَامِ

تاليف

الاستاد الاوحدى الملا خليل العمرى السعردى

طيب الله ثراه وجعل الجنة مثواه آمين

Weşanxana Kurdistan
Publishing House of Kurdistan

ISBN 91 87096 02 1